



Aqahî derbarê rêya xwestina Vîsa însanî/mirovantî

Qerara hêsankirina derxistina Vîsa-mêvandariyê ji bo xizim û malbatên Sûrî ku di 04.09.2013 an de derketibû, di 29.11.2013 an de ji aliyê daîreya koçberiyê ve (SEM) hat rawesandin.

Ji ber vê yekê îro nema mumkîn e endamên malbatê di çarçoveya vê qerarê de ji bo Swîsre werin dawetkirin.

Kesên dixwazin doza Vîsa-mêvandariyê bikin, dikarin niha tenê daxwaza **Vîsa însanî/mirovantî** bikin.

Ji ber mirovên ji Sûriyê nikarin îsbat bikin, ku ew ê piştî sê mehan careke din ji Swîsre derkevin, **daxwazên Vîsa-mêvandariyê nayên qebûlkirin.**

1. Vîsa însanî/mirovantî; wate û pîvan:

Pîvan û şert ji bo Vîsa însanî/mirovantî cuda ne ji pîvanên ji bo Vîsa di çarçoveya qerara 04.09.2013 de.

Li gorî SEM „Welatîyên biyanî, yên ku ji bêçarî dixwazin welatê xwe berdin, dikarin bi rêya nûnertî an jî mûmesîliya Swîsre li derve pirsax daxwaznameya Vîsa bikin, eger ew dikarin ji ber rewşa şexsî vîsa ji bo Swîsre werbigirin yan na. Vîsa ji ber sedemên însanî dikare were dayîn, dema **di rewşa kesane de were texmînkirin, ku gîyan û laşeyê xwediyê daxwaznameya Vîsa bi şêweyekî rasterast û ciddî di bin gef û tehdîdê de ye.** Kesên ku berê li welatekî sêyemîn dijîn, bi giştî tê texmînkirin ku tu gef û tehdîd li ser wan nîn e.“

<https://www.bfm.admin.ch/bfm/de/home/themen/einreise/faq.html>

Mirov divê bikaribe gef û tehdîda şexsî heya dereceyeke bilind îsbat bike, yan jî daxwaznameya vîsa nayê qebûlbikirin.

2. Çawa mirov dikare sozêkê bistîne:

Daku mirov daxwaza vîsa însanî ji bo Swîsre bike, divê mirov bi nûnertî û mûmesîliya Swîsre re li derve **rasterast** têkeve têkîliyê ji bo standina sozêkê.

Rêya herî baş ji bo standina sozêkê şandina E-Mailekî ji bo van navnîşan û adrêsên xwarê ye:

- ist.visa@eda.admin.ch ji bo Istanbul
- beyvis@eda.admin.ch ji bo Beyrût
- amm.visa@eda.admin.ch ji bo Emman

Navnîşan û adrêsên welatên dîtir hûn dikarin di vê malperê de bibînin:

<https://www.eda.admin.ch/eda/de/home/laender-und-reiseinformationen.html>





Di E-maila ji bo daxwaza standina sozekê de gerek e ev agahiyên dîtir hebin:

- Daxwaza **Vîsa Însanî** tê kirin (ne vîsa-mêvandariyê!)
- Nav, pêşnav, rojbûna hemû kesên dixwazin daxwaza vîsa însanî bikin
- Nav, pêşnav, rojbûn û navnîşan/adrêsa yekî an jî bêtir ji xizim û mirovên li Swîsre dijîn (eger hebin)

Haydarî: Daxwaz ji bo vîsa mesrefeke bilind e û xeter e, ji ber ku divê mirov ji bo vê yekê biçe welatekî sêyemîn.

Ji ber wilo em we şîret dikin baş bifikirin, şans û xeterê jî temam di ber çavên xwe re derbas bikin.

Heke sefaretê soz neda we, hûn dikarin ji vê navnîşanê re binivîsin: syrien@redcross.ch.

3. Derbasbûn û pêvajoya wexta sozê:

Ji bo sozê sefaret tercûmanekî tîne.

Ji bo vîsa însanî sefaret pereyan naxwaze!

Soz/ termîn pir kurt e û lazim e ji ber wê **pir baş hatibe amadekirin**.

Divê hûn van **belge û kaxetên** xwarê bidin:

- Kopyeyek ji E-maila bo daxwaza sozê ji bo vîsa
- Formeke (1) daxwaznameya vîsa temam dagirtî (bi Almanî, Fransî, Îtalî an jî Îngilîzî) bi nivîsa makîne an jî bi tîpên gir û bi îmzeya kesane. Hûn dikarin Formê li ser vê girêdanê bibînin:
<https://www.bfm.admin.ch/bfm/de/home/themen/einreise/visumantragsformular.html>
- Belgeyek seferê (Passeport an jî nasname)
- Kopyeyek ji belgeyên seferê
- (2) Sûretên şexsî nû û wekhev ji bo passeportê
- Defternameya Malbatê (Defter Al aelê) mîfesel

Ji kerema xwe re bi daxwaznameyê re bersivên van pirsan bi Almanî, Îngilîzî an jî Fransî bînin. Rewşa mirov divê **nivîskî** pir bi kitekit û tefsîl were şîrovekirin, daku hemû agahiyên ji sefaretê re ji bo qerarê lazim in, hebin. Agahiyên mirov bi devê xwe bêje nayên qebûl kirin.

- Pirsgerêk û muşkîleyên xwe yê şexsî li welatê xwe bi tefsîl şîrove bikin?
- Hûn li cem hukûmeta Tirk/Libnanî/ Urdunî an jî li cem UNHCR qeydkirî ne? Eger Na, çima na? Eger erê, rewşa daxwaza we li cem UNHCR çî ye?
- Hûn li kampên penaberên Sûriyê li parastin û hîmayetê geriyane? Eger Na, çira na?
- Rewş û mercên jiyana we ji aliyê (Xanî, xizim û mirov, rewşa maddî) li Tirkîyê/Libnan/Urdunê çawa ne?
- Çira berdewamkirina mayîne li Tirkîyê/Libnan/ Urdunê ne mumkîn e?





Eger we **Sûriyê berdibe tenê ji bo xwestina vîsa insanî**, gelekî girîng e hûn vê yekê **nivîskî** di bersivên xwe de li ser pirsan bêjin.

Eger pirsên we hebin an jî bêtir agahî ji we re divên, hûn dikarin li ser vê navnîşana li jêr bigihînin me:

syrien@redcross.ch

Schweizerisches Rotes Kreuz
Departement Gesundheit und Integration
Abteilung Integration und Rückkehr
Rainmattstrasse 10
Postfach
CH-3001 Bern

